Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :838 17-Sibat- 2021 Rojnameya Siyasî û Çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165

# Lîstika ‘Peyvên Kurdî’ kêfxweş û hîn dike

Endezyarê nivîsbariya kompîterê Ferhat Baysal, lîstikeke dijîtal a dikeve bin xizmeta dîrok, ziman û Kurdî de çêkir. Lîstika ‘Peyvên Kurdî’ bi zaravayê Kurmancî û bi tîpên latîniye.
Endezyarê nivîsbariya kompîterê Ferhat Baysal lîstikek dijîtal a dikeve bin xizmeta dîrok, ziman û çanda Kurdî de çêkir. Hun dikarin ji bilî zimanê Kurdî, zimanên Tirkî, Ingilîzî, Elmanî, Fransî, Spanî, Îtalî û Rûsî jî lîstikê bilîzin.
Hun dikarin bi lîstika ‘Peyvên Kurdî’ demeke xweş derbas bikin.
Lîstika ‘Peyvên Kurdî’ bi zaravayê Kurmancî û bi tîpên latînîye. Ji bo kesên bixwazin derbarê dîrok, ziman û çanda Kurdî de peyvan hîn bibin, hilbijêrka zimanê din jî di nava lîstikê de heye.
Lîstik ji peyvên Kurdî pêktê. Heya niha 30.000 hezar peyv hatine bar kirin û wê her biçe, peyvên zêdetir lê bên barkirin.
Endazyar Ferhat Baysal Kerboranî diyar kir wî ev lîstike nû çêkiriye û dixwaze dibin sêwana ‘Leyzok’ de gelek berhemên bi vî awayî yên xizmetê ji çand û zimanê Kurdî re bike, berhem pêk anîne. Ferhat Baysal beriya niha Lîsikên bi navê Pirs û Listika ji bo zarokan ya bi navê Stêrêgerê Kurd jî weşandibû.
Ferhat Baysal têkildarî şêwazê bikaranîna lîstikê van agahiyan da; “Aplîkasyona “Peyv” ji gelek zimanan pêk tê. Her zimanek ji gelek astan pêk tê. Heya astek neqede astên din qufilkirî dimînin. Dema mirov astan diqedîne, mirov dibe xwediyê jeton û pileyan. Ji bo her dîtina peyvan pile tê dayîn. Weke din di hûndirê aplîkasyonê de dide ku lîstikvan fêrî Kurdî bibe. Eger hûn bixwazin Kurdiya xwe pêş bixin teqez bilîzin, di dawiya listikê de hûn ê zimanê Kurdî bêtir fêr bibin. Ji xwe wekî ku me destpêkê anî ziman hûn dikarin bi zimanên din jî bilîzin û fêrî gelek peyvan bibin. Di navê de beşa îstatîstîk û encama pêşbirkêyê jî heye ku lîstikvan û kesên beşdar dikarin bi hêsanî bigihijin agahiyên derbarê lîstika xwe û yên din de.”
Li gorî zanyariyên ku Ferhat Baysal daye, lîstik nû hatiye barkirin û heya niha li ser “Play Store’ nêzî gelek şîrove û gelek barkirin hatine kirin.
Lînka aplîkasyona “Peyvên Kurdî”: https://play.google.com/store/apps/details?id=com.kurdish.words
*ROJNEWS*



## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | A | ■ | K | ■ | N | İ | G | A | Ş |
| 2 | A | P | İ | K | O | ■ | O | ■ | Û |
| 3 | ■ | Z | ■ | O | ■ | A | R | A | V |
| 4 | J | ■ | A | R | D | ■ | E | W | ■ |
| 5 | İ | D | ■ | T | İ | R | ■ | Ê | L |
| 6 | ■ | O | X | ■ | H | ■ | E | N | E |
| 7 | K | ■ | A | M | A | N | ■ | E | Y |
| 8 | E | J | N | Û | ■ | A | Ş | ■ | L |
| 9 | W | ■ | İ | ■ | İ | N | ■ | R | A |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | ■ | | ■ | | | | ■ | | |
| 2 | | | | | | ■ | | | |
| 3 | ■ | | ■ | | | | ■ | | ■ |
| 4 | | ■ | | ■ | | | | ■ | |
| 5 | | | | | ■ | | ■ | | |
| 6 | ■ | | | ■ | | | | | |
| 7 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 8 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 9 | | ■ | | | | | | | ■ |

**JÊR-JOR**

. Ji bo bûkê, birayê zavê... Davik
2. Xwîşka bavê mirov... Aletê ku demê nîşan dide
3. Diravê ku ji aliyê dewletê ve ji welatiyan tê girtin... Li Colemêrgê gotina ‘yek’ê
4. Dijberê rengê spî
5. Cihê herî kûr yê okyanûsan û devera ku tîrêjên rojê nagihîjinê... Mehek
6. Lîstikeke ku bi neh keviran tê lîstin
7. Dûxan
8. Yekeya giraniyê ku li Fransa 30,59 gr û li Ingilistanê jî 28,349 gr û li Holanda jî 100 gr e... Xweliya piştî şewatê
9. Kurtebêja Ksenonê... Pirsgirêk

**ÇEP-RAST**

. Sir, tişta her kes pê nizane... Baneşana kêfxweşiyê
2. Navbera du tiştan... Bi erebî “ez”
3. Rengek
4. Jimarek
5. Sala em tê de ne... Agir
6. Kurteya elementa Aktînyûmê... Her tişta têkildarî debara jiyanê
7. Kurteya elementa hesin... Beşeke malê, jûr... Kar û xebat
8. Awayê bangkirinê ya xwîşka mezin... Genimê hêrayî
9. Bajarekî me

## Quncika têgînan

| | |
|---|---|
| Endam | 1.Kesê ji komeke taybet: Endamê Koma Awazên çiya. Endamê partiyê. Endamê malbatê. Endamê gelekî. 2. Parçeyên bedenê: Mînak; çav û dest endam in. 3. Parçeyek ji tevayiya tiştekê. |
| Folklor (Fransî) | Zanista gel, zargotin, çîrok, helbest, stiran û govendên gelêrî. Hunera di nava gel de belav bûyî lê afrînerên wê nayên zanîn. |
| Komplo (Fransî) | Plana kesekî yan çend kesan li dijî kesekî, yan komekê, yan dewletekê. |
| Merasim (Erebî) | Dêlîndêz, rêûresm, ayîn, resmiyet, seremonî. Civîneke fermî ji bo pîrozkirin yan jî bîranîna kesekî yan bûyerekê: Ji bo bîranîna şehîdan merasimek hat lidarxistin. |
| Mêtîngeh | Kolonî, welatê yan devera dagîrkirî. Welatê biyanî tê de serdest in. |
| Mêtînger | Kesên mêtîngehan bi rê ve dibin, dagîrker. |
| Nivîsgeh | Bûrû, ofîs, daîre, dezgeh: Em çûn nîvîsgeha kirîna xaniyan. |
| Pirtûk | Komek perên kaxizan yên binivîs yan biwêne yên di nava du bergan de hatîn çapkirin. Kitêb. |
| Proje (Fransî) | 1.Karekî diyarkirî yê ku piştî çend qonaxan bi dawî dibe: Rêveberiyê ji bo bêkaran projeyek amade kiriye. 2. Plan, progrem, bername, amadekerî. Ti kes nizane ka plan û projeyên wî çi ne. |
| Şermezar Şermezarkirin | Şermezar: Kesên ketîn şermê, kesên ji ber kêmayiyên xwe şerm dikin: Ji ber ku bavê min dît ez cigareyê dikişînim, ez şermezar bûm. Şermezarkirin: Diyarkirina qebûlnekirina gotin yan kiryara kesekî yan hêzekê. Rûreşkirin: Welatiyan kuştina jinan şermezar kir. |

## ‘Li peykên Ûranusê dibe ku okyanûsên mezin hebin’


Tê texmînkirin ku li pênc peykên Ûranusê, ku ji aliyê girseyê ve çaremîn mezintirîn gerstêrka Sîstema Rojê ye, di binê erdê de okyanûs heye.
Yekîtiya Jeofîzîk a Emerîkî di kongreya xwe ya payîza 2020’î de lêkolîneke nû ya li ser peykên Ûranusê parve kiribû.
Lêkolîn li ser peykên Mîranda, Tîtanîa, Oberon, Arîel û Ûmbrîelê yên Ûranusê hate kirin. Peykên navborî ji ber ku dişibin peyka Jupîterê Europa hatin hilbijartin û di bin erdê Europayê de okyanûseke mezin heye.



Hate ragihandin ku rûyê erdê yê van peykan dişibe volkanên ji qeşayê (cryovolcano). Ev jî tê wê wateyê, dibe ku di binê erdê van peykan de materyalên bi avê û dûkelê hebin.
Lêkolîn li gorî dîmenên maşîna fezayî Voyager 2 ve hatibûn kişandin, hate kirin. Voyager 2 sala 1986’an ji fezayê re hatibû şandin.

## Mûmyayên zimanzêr hatin kifşkirin

Yekîneyek ku ji arkeologan pêk tê, li perestgeheke li bajarê Îskenderiye ya Misrê Mûmyayên bi ziman zêr kifşkirine.
Li gorî daxuyaniya ji aliyê Wezareta Kevnareyan, li Perestgeha Taposîrîs Magnayê Mûmyayên berî 2 hezar salan kifş kirin.
Hate tesbîtkirin ku Mûmyayên ziman zêr kifşkirine. Mirovên zanyar wer difikirin ku ‘ziman zêr’ pêkanîneke li ser miriyan e tên kirin. Di wê baweriyê de ne ku mirî bi vî rengî li gel xudayê Osîrîs diaxivin. Osîrîs di mîtolojiya Misrê de xudayê cehenememê yê ku miriyan didarezîne ye. Perestgeha Taposîrîs Magna diyarî Osîrîs, hevjîn û heman demê xwişka wî xudawend Îsîs hatiye kirin.
Arkeologan berî niha maskeyeke ya heyvê ku aîdê jinekê bû, 8 parçeyên wê ji zêr û maskeyeke ji 8 parçeyên mermer ku demê Greko-Roma dîtibûn.
Lêkolînvanan her wiha portreya Kleopatra û hinek pereyên metal ku navê wê li ser kifş kiribûn.



## Garê ji dagîrkeran re bû goristan

Hin xewn û xeyal dibin bela serê mirovan. Dewleta tirkî ya dagîrker ji bo dagîkirina Garê, Şingalê û dorpêçkirina bakur û rojhilatê Sûrî bi hêviyake mezin berê xwe da herêmê. Lê gerîlayên Kurdisatanê Garê li wan kirin dojeh..*R-3*



## KCK: Em Rêber Apo bikin rêberê mirovayiyê

Konseya Serokatiya Giştî ya KCK’ê diyar ku armanca komployê ew bû ku Kurdan bê Rêbertî, nasname û statû bihêlin û got, em bang dikin ku emê Rêber Apo pirtir bikin yê mirovayiyê.. *R-4*

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 839 17-Sibat- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## Hêzên Ewlekariyê nasnameya endamekî xwe yê şehîd eşkere kir


Hêzên Ewlekariya Hundir ragihand ku endamê wan Mihemed El-Mişel roja Yekşemê li bajarê Qamişlo di encama qezayeke trafîkê de şehîd bûye. *R-2*




# Şevekê ji nişka ve reviyan


KCK’ê têkildarî êriş û berxwedana li Garê daxuyanî da û got, hêzên dagîrker yên digotin emê şevekê ji nişka ve werin û propagandaya tasfiyekirina gerîla dikirin, digel her cure teknîk û bombebaranê, li benda serkeftinê bûn lê di binê wê bombebaranê de şevekê ji nişka ve reviyan. *R-5*

## Berxwedana 23 salan komplo têk bir



15ê Sibata 1999an bi komployeke navneteweyî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan radestî dewleta tirkî ya dagîrker hat kirin. 22 sal in li hemberî wî kiryarên dijmirovî tên kirin. *R-5*

## Av bûye amûrekî şantaj û guhertina demografiyê



Dewleta tirkî ya dagîrker ku xwe dewleteke qanûnî pênase dike, li hemberî gelê bakur û rojhilatê Sûriyê avê weke çekekê bi kar tîne û qanûnên navneteweyî û mafê gel yê bidestxistina avê, binpê dike. *R-6*

## Hesekê bi pêşengeheke wêneyan komploya navneteweyî şermezar kir



Li dijî komploya navneteweyî ya 15`ê Sibata 1999an ya li dijî rêber Abdullah Ocalan, li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê çalakiyên cuda tên lidarxistin. *R-7*

## Navenda PENa Kurdî bi navê “Li Îranê Qirkirina Kurdan” raporek weşand

Navenda PENa Kurdî têkildarî sûcên hikumeta Îranê yên li dijî gelê Kurd û hemelyên girtinê li rojhilatê Kurdistanê raporek belav kir.. *R-4*

PENa KURD

## Fikrê azad nayê girtin

22 sal di ser komploya navneteweyî ya li dijî rêber Abdullah Ocalan re derbas dibin. Ocalan bi fikir û felsefeya xwe ya azad piştgiriya gelên bindest kir û şoreşeke demokratîk da destpêkirin. Lê hêzên komploger xwestin pêşiya vê projeya wî bigirin. *R-6*

# Hêzên Ewlekariyê nasnameya endamekî xwe yê şehîd eşkere kir

Hêzên Ewlekariya Hundir ragihand ku endamê wan Mihemed El-Mişel roja Yekşemê li bajarê Qamişlo di encama qezayeke trafîkê de şehîd bûye.

Hêzên Ewlekariya Hundir ragihand ku endamê wan Mihemed El-Mişel 14`ê Sibatê di encama qezayeke trafîkê de li bajarê Qamişlo şehîd bûye. Hêzên Ewlekariya Hundir sersaxî ji malbata şehîd Mihemed re xwest û soza şopandina xeta şehîdan heta pêkanîna ewleyî û aştiyê nû kir.
Li gorî daxuyaniyê nasnameya şehîd wiha ye: Nav û paşnav: Mihemed El-Mişel. Navê dayîkê: Sûad. Navê bav: Ebdullah. Cih û dîroka tevlîbûnê: Qamişlo 24-11-2015. Cih û dîroka şehadetê: Qamişlo 14-2-2021

# Li navçeya Tirbespiyê 14 şehîd hatin bîranîn



Meclisa Malbatên Şehîdan ya navçeya Tirbespiyê, 14 şehîdên di meha Sibatê de li herêmên cuda şehîd bûyîn, bîr anîn.
Meclisa Malbatên Şehîdan ya navçeya Tirbespiyê, bi beşdariya bi dehan şêniyên navçeyê, 14 şehîdên di meha Sibatê de li herêmên cuda şehîd bûyîn, bîr anîn. Navê şehîdên hatîn bîranîn wiha ne: Xebat Xilo, Cemşîd Silêman, Dîrok Sêfo, Riyad Elî, Ebdull Helîm Ehmed, Baz Îbrahîm, Mamoste Henan, Botan Tehlo, Mûfîd Ehmed, Hemûd Xelef, Dilo Tirbespiyê, Iskender Hacî, Hozan Silêman û Mihemed El-Hebîb.
Di merasimê de piştî rêzgirtinê malbatên şehîdan find pê xistin û derbarê şehîdan û gotinên rêber Abdullah Ocalan de sînevizyonek hat pêşkêşkirin.
Di merasimê de hevserokê Meclisa Malbatên Şehîdan ya herêma Cizîrê, Hesen Ibêd bal kişand ser fedakariya şehîdan ya ji bo gihîştina azadiyê.
Herwiha helbestvan Cemal Hisên helbesteke Cegerxwîn ya derbarê şehîdan de pêşkêş kir.
Di dawiya merasimê de wesîqeyên şehîdan hatin xwendin û radestî malbatên wan kirin.

# Şervanê QSD'ê Mihemed Elî li Amûdê hat veşartin



Bi merasimeke girseyî cenazeyê şervanê QSD'ê Mihemed Elî (Ebû Elî) li goristana Şehîd Îsamîl ya li Amûdê hat veşartin.
Bi sedan şêniyên navçeya Amûdê cenazeyê şervanê QSD'ê Mihemed Elî (Ebû Elî) ku 10'ê Sibatê li Minbicê şehîd bûbû, bi merasimekî spartin axê.
Welatiyan cenazeyê şehîd ji ber navenda Meclisa Malbatên Şehîdan ya navçeya Amûdê girtin û bi piya ber bi goristana Şehîd Îsamîl ve çûn.
Di merasima li goristanê de ji fermandarên QSD'ê Rojava Mihemed axivî û got, em îro lehengekî din ji lehengên QSD'ê dispêrin axê. Şehîd Mihemed ji bo welatê xwe têkoşiya, soz da hevalên xwe û heta şehadetê li ser soza xwe bû."
Berdevkê fermî yê Lîwa Şemal El- Demokratîk Mihemed Hebîb jî di axaftina xwe de soza şopandina têkoşînê heta pêkanîna serkeftinê û derxistina dagîrkeran ji xaka Sûriyê da.
Piştî axaftinan, nasnameya şehîd hat xwendin û radestî malbata wî hat kirin.
Cenazeyê şehîd di nava durişman de hat veşartin.

# QSD`ê li Dêrezorê 9 çete girtin


QSD`ê bi du operasyonên ewlekariyê li gundewarê rojhilatê Dêrezorê de 9 çete girtin.
Navenda Çapemeniyê ya Hêza Sûriya Demokratîk (QSD) ragihand ku hêzên wan tevî hêzên Koalisyona Navneteweyî 10 û 11`ê Sibatê li gundewarê rojhilatê Dêrezorê, du operasyonên ewlekariyê li dar xistine.
Li gorî navendê, di operasyona 10`ê Sibatê de 8 çete hatine girtin û di operasyona 11`ê Sibatê de jî çeteyek hatiye girtin.
Navendê da zanîn ku di her du operasyonan de miqdareke çek, cebilxane û cîhazên pêwendiyê hatine desteserkirin.

# Li Qamişlo, "Dîfa El-Wetenî" êrişî Hêzên Asayişê kir

Endamên "Hêzên Dîfa El-Wetenî" yên girêdayî hikumeta Şamê, li Qamişlo êrişî bendeke kontrolê ya Hêzên Asayişê kirin.
Endamên "Hêzên Dîfa El-Wetenî" yên girêdayî hêzên hikumeta Şamê, gule ber bi benda kontrolê ya Hêzên Asayişê ya nêzî çarriyana Wehde ya bajarê Qamişlo reşandin.
Piştî êrişê hêzên Ewlekariya Hundir tedbîrên ewlekariya bajar xurt kirin.

# Li Kobanê ciwanek kuştî hat dîtin

Li ser riya gundê Xezîne yê li başûrê kantona Kobanê cenazeyê ciwanekî ku bi guleyan hatiye kuştin, hat dîtin.
Sedema bûyerê heta niha nehatiye zanîn
Roja Şemiyê cenazeyê ciwanê bi navê Fewaz Kehîl Cuma (24) li ser riya gundê wî kuştî hat dîtin.
Hêzên Ewlekarîya Hundir, bi lez çûn cihê bûyerê û rê girtin.
Heta niha detayên bûyerê nehatine zanîn û Hêzên Ewlekariya Hundir lêpirsînê didomîne.



# Çeteyên dewleta tirkî dest avêtin jineke Ereb



Li Serê Kaniyê ya dagîrkirî, çeteyên dewleta tirkî ya dagîrker bi awayekî komî destavêtin jineke Ereb.
Çalakvanan li ser malperên tevna civakî, wêneyê jineke Ereb ya bi navê {R.B} belav kir û piştrast kirin ku endamên beşa istixbaratê ya qaşo Polîsên Leşkerî yên girêdayî hêzên dagîrker yên tirkî li bajarê Serê Kaniyê yê dagîrkirî, dest avêtînê.
Dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê yên qaşo bi navê "Artêşa Nîştimanî ya Sûriyê" 9`ê Cotmeha 2019`an êrişî Serê Kaniyê kirin.
Li gorî çalakvanan, Ruqeye ji hêla istixbarata leşkerî ya dewleta tirkî ya dagîrker ve hatiye revandin û çeteyên bi navê Sedûn Qeytûn û Ebdulrezaq El-Mewlûd dest avêtînê.
Çalakvanan bîr xist ku Sedûn Qeytûn ji gundewarê Idlibê û endamê istixbarata "Polîsên Leşkerî" ye. Ebdulrezaq jî ji Dêrezorê ye û endamê beşa erkên taybet ya "polîsên Serê Kaniyê" ye.

# Nivîsgeha Parastina Zarokan ya Hesekê 6 zarok radestî malbatên wan kirin



Nivîsgeha Parastina Zarokan di Nakokiyên Çekdarî de ya kantona Hesekê li gorî lihevkirina bi aliyên navneteweyî re hatî imzekirin, 6 zarok radestî malbatên wan kirin.
Li gorî lihevkirina di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û aliyên navneteweyî de QSD`ê 6 zarok radestî Nivîsgeha Parastina Zarokan kirin.
Zarok li avayiya nivîsgehê bi beşdariya hevserokê nivîsgehê Xalid Cebir radestî malbatên wan hatin kirin.
Derbarê mijarê de Xalid Cebir got, li gorî lihevkirina di navbera QSDê û Neteweyên Yekbûyî (NY) de me 6 zarok radestî malbatên wan kirin.
Cebir da xuyakirin ku zarok ji ber gelek sedeman tevlî hêzên leşkerî dibin, yek ji wan sedeman jî mercên şer û bandora li ser wan e. Cebir da zanîn ku ji bo mijara tevlîbûna zarokan ya QSD`ê, rojane bi QSD`ê re dicivin.
Cebir di dawiyê de wiha got: "Tersê propagandaya hinek dezgehên çapemeniyê, QSD bi nivîsgehê re di vî warî de hevkar e û piştî pêşkêşkirina delîlan, gelek zarok radestî malbatên wan hatin kirin."
Ji dema vekirina Nivîsgeha Parastina Zarokan ve 38 zarok radestî malbatên wan hatine kirin.

# Çeteyên her du jinên pêşeng kuştîn, hatin girtin



Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) ew çeteyên hevseroka Meclisa bajarokê Til Şayîr Seida El-Hermas û cîgira wê Hin El-Xidêr şehîd xistîn, girtin.
Li gorî çavkaniyên leşkerî yên Hêzên Têkoşîna li dijî Terorê yên girêdayî QSDê, hêzên wan bi operasyoneke li gundewarê Dêrezorê du çeteyên hevseroka Meclisa bajarokê Til Şayîr Seida El-Hermas û cîgira wê Hind El-Xidêr şehîd xistîn, girtine.



# Barê hunerê giran e, lê xweşiya wê heye

Li bakur û rojhiltê Sûriyê tevî zor û zehmetiyan hunermend li çanda xwe xwedî derdikevin. Du sazvanên ku di şahiyên heft şev û heft rojan de amade dibûn, bi kelecaneke mezin huner xwe didomînin.

Leylan RESO/Ronahî Qamişlo

**"JI HUNERA XWE HES DIKIM"**
Têkîldarî mijarê sazvan Mehmûd Îsa li ser saz û awazên mûzîkê wiha axivî: "Ez 67 salî me. Li malê, bavê min her tim li zirne lê dixist. Ji ber wê min mereqa hunerê kir. Ez ji hunerê pir hes dikim. 40 sal in li zirneyê dixim. Em li sazên kurdî tenê dixin. Dema li zirneyê didim, pir keyfxweş dibim. Hestê min di dengê zirneya min de diyar dibe. Dema li dawetan amade dibin û bi amûrên kevnar lê dixin em keyfxweş dibin. Def û zirne li cem me ne wisa ye ku em dev jê berdin. Ji ber ku amûrên din derketine û pêşketin çêbûye êdî ti kes li zirneyê naxe. Em bi karê xwe gelek keyfxweş in. Ku qîmetê def û zirneyê nemîne jî, heta roja dawî ya jiyana xwe emê lê bixin

**"ÇANDA ME NASNAMEYA ME YE"**
Mihemed Umer jî (64) li ser mijarê wiha axivî: "Destpêkê ku me çavê xwe vekir, saz di hundirê me de bû. Def, zirne û tembûr hebûn. Di malê de bapîr, bav, ap û birayê min li van amûran dixistin. Piştî ku min dît ev amûr biqîmet in min jî dest bi wan kir û heta roja îro dewam dike. Em tevlî dawetên heft şev û heft rojan dibûn. Lê niha guhertineke demografîk çêbûye û ev adet nemane. Hêvî dikim ku her hunermend li hunera xwe xwedî derkeve. Çimkî huner eşkerekirina hest û helwestên min e.
Mihemed Umer axaftina xwe bi van gotinan bi dawî kir: "Em bi civaka xwe ve girêdayî ne. Çimkî çanda me nasnameya me ye. Em moralê ji gel digirin û gel jî ji me digire. Bi wî awayî em hev temam dikin. Barê hunerê giran e, lê xweşiya wê heye. Bi hêvî me hunermend tev li çanda xwe xwedî derkevin. Çimkî mirov tiştên berbiçav dike huner û pêşkêşî civakê dike.



## Hesekê bi pêşengeheke wêneyan komploya navneteweyî şermezar kir



Li dijî komploya navneteweyî ya 15`ê Sibata 1999an ya dijî rêber Abdullah Ocalan, li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê çalakiyên cuda tên lidarxistin.
Li taxa Nasra ya bajarê Hesekê, 10`ê Sibata 2021ê bi durişma "Azdî Ji Bo Rêber Abdullah Ocalan" Tevgera Ciwanên Şoreşger, bi hevkariya Tevgera Çand û Hunerê, bi wêne û pirtûkên rêber Abdullah Ocalan pêşangehek li dar xist.
Pêşengeh ku bi wêneyên Abdullah Ocalan û dayîka wî hatibû xemlandin, çar rojan dewam kir. Roja yekê bi dehan endamên Kongreya Star û şaredariya bajarê Hesekê tevlî pêşangehê bûn. Di dewama pêşangehê de gelek endamên saziyên civaka sîvîl û xelkê taxê tevlî bûn.
Komîteya amadekar ya pêşangehê, diyar kir ku armanca lidarxistina pêşangehê, belavkirina fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan e. Herwiha da zanîn ku wê heta azadiya rêber Abdullah Ocalan van çalakiyên xwe bidomînin.
Wek tê zanîn bi armanca qirkirina gelê Kurd, Cotmeha 1998an komployê dest pê kir û heta roja me ya îro jî dewam dike. *Ronahî/Qamişlo*

# HRRK'ê nivîsgeha xwe li Dêrikê vekir

Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê (HRRK) bi beşdariya bi dehan rewşenbîr û nûnerên partiyên siyasî nivîsgeha xwe li bajarê Dêrikê vekir.
Merasima vekirina nivîsgehê bi deqeyeke rêzgirtinê dest pê kir.
Serokê Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê Welîd Bekir, vekirina nivîsgehê pîroz kir û hêviya rizgarkirina tevayiya herêmên dagîrkirî kir.
Bekir da zanîn ku ji ber vîrûsa korona vekirina nivîsgehê dereng ma û got, wê ev nivîsgeh li pêşiya rewşenbîr û wêjevanan vekirî be û ji îro pêve çalakî lê were kirin.
Ji rêveberên HRRK'ê Mehmûd Ebdo jî got, wê nivîsgeh çalakiyên fikirî yên li ser çanda kurdî û cîhanê pêşkêş bike ku yek ji armancên HRRK'ê ye."
Berpirsê Komîteya Çalakiyan ya HRRK'ê Ehmed Huseyîn jî behsa dîroka damezirandina HRRK'ê kir û diyar kir ku HRRK piştî nîqaşên bi gelek rewşenbîrên Rojava û derveyî wê re angu piştî serhildana Qamişlo ava bû û got, HRRK'ê ji destpêkê heta niha 91 çalakiyên çandî û mihrîcanên mezin li dar xistine.
Di merasimê de bi navê Partiya Azadî ya Kurdistanê – Sûriyê û Platforma Gel û axaftin hatin kirin. Herwiha gelek nivîskaran jî nêrînên xwe anîn ziman.
Di dawiya merasimê de pirtûk li beşdaran hatin belavkirin û stiranên foklorî hatin gotin.
*ANHA*



# 'Jin bixwazin dikarin her tiştî bikin'

Derhênêra jin ya Efxanistanê Saba Sahar, di 25'ê tebaxê de gule lê hatibûn reşandin. Sahar diyar kir, ji ber ku ew jineke berxwedêr e Talîbanan xwestiye wê bikujin
Saba Sahar derhênera jin a yekemîn a Afganistanê ye. Heta niha derhêneriya gelek fîlman kiriye. Bi navê 'Enstîtuya Fîlman a Sabayê' şîrketek damezrandiye û heta niha derhêneriya 3 fîlmên serbixwe kiriye. Di rêzêfîlmê bi navê 'Komîser Amanullah' de, derhênêrî kiriye û bi karakterên jinên jêhatî û serbixwe cih digire. Sahar hem di fîlmên cih girtî ye de û hem jî di yên derhêneriya wan kirî de, tim li hember hişmendiya axa, baronên tiryakê û mêrên ku şer dixwazin û bi taybetî li dijî hişmendiya Talîbanan sekiniye.
Di sala 1996'an de, dema ku hikûmeta Talîban ji ber ku sînamayê wek bêaxlaqî didît qedexe kiribû, wê demê senaryoya wê ya yekemîn di destê Saharê de bû. Piştre Talîban arşîvên hemû şîrketên fîlman dişewitîne û wan îmha dike. Wê demê jî Sahar xwe xilas dike û ji Pakistanê berê xwe dide Amerîkayê. Piştî ku hikûmeta Talîban hildiweşe, ew careke din vedigere bajarê Kabûlê û ji bo şîrketeke fîlman ji nû ve ava bike, dest bi xebatên xwe dike.



Ji mirinê difilite
Sahara ku gelek caran Talîbanan gef lê dixwar, di 25'ê tebaxa 2020'an de li paytexta Afganistan gule lê hatin reşandin. Di êrîşa li derhênerê hat kirin de ji mirinê difilite û du alîkarên wê jî birîndar dibin.
Derhêner Sahar beriya bûyera êrîşê di hevpeyvîneke xwe de ku bi rojnameya Guardianê re kiriye, wiha dibêje; "Armanca min a yekem ew e ku ez nîşan bidim ku 'jin dikarin her tiştî bikin'. Ez ji wê hişmendiya muhafazakar re ku jin xistine navbera çar dîwaran, dibêjim ku dema hûn pêşiya wan jinan vekin, wê demê pêşketin û afirandina jiyaneke nû ya li vî welatî bibînin û ez di fîlmên xwe de vê yekê nîşan didim û qîr dikim."
Hewceyî gotinê ye ku li Afganistanê di van salên dawî de her diçe êrîşên Talîbanan ên li ser rojnameger, aktîvîst û xebatkaran zêdetir bûne.

## Li ser komployê şanoyeke bêdeng



Koma Ararat ya Navenda Çand û Hunerê ya bajarê Hesekê di roja 4an ya pêşangeha wêneyan de bi navê "Azadiya Mirovan " şaneyoke bêdeng pêşkêş kir.
Bi armanca şermezarkirina Komploya Navneteweyî ya li dijî rêber Abdullah Ocalan li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê bi durişma "Azadî û Adalet ji rêber Abdullah Ocalan re" çalakiyên cuda li dar dikevin. Tevgera Ciwanên Şoreşger ya Sûriyê, bi hevkariya Tevgera Çand û Hunerê û Yekîtiya Rewşenbîrên bajarê Hesekê 10`ê mehê pêşangeha wêne û pirtûkên rêber Abdullah Ocalan vekir.
Konê çalakiyê ku li baxçeyê rêber Apo yê li taxa Nasrayê hatiye vegirtin, bi wêneyên rêber Abdullah Ocalan û sembolên kurdî hat xemilandin.
Di pêşangehê de bi dehan tabloyên wêneyên rêber Abdullah Ocalan û diya wî û bi sedan parêznameyên wî hatin pêşandan.
Di roja 4an ya pêşangehê de bi dehan endamên Hêza Ewlekariya Hundir, HPC, endamên Meclisa Civakî ya Ermeniyên li bajarê Hesekê û endamên Meclisa Giştî ya PYD`ê beşdarî çalakiyê bûn.
Pişt re koma Ararat ya navenda Çand û Hunerê ya bajêr bi navê "Azadiya Mirovan" şanoyeke bêdeng pêşkêş kir û tê de bal kişand ser Komploya Navneteweyî ya li dijî rêber Abdullah Ocalan û girtiyên li girtîgehên dewleta tirkî.

# Av bûye amûrekî şantaj û guhertina demografiyê

Dewleta tirkî ya dagîrker ku xwe dewleteke qanûnî pênase dike, li hemberî gelê bakur û rojhilatê Sûriyê avê weke çekekê bi kar tîne û qanûnên navneteweyî û mafê gel yê bidestxistina avê, binpê dike.

Berî çend rojan careke din dewleta tirkî ya dagîrker ava çemê Firatê kêm kir ku li aliyê Sûriyê bi sedhezaran cotkar sûdê jê ne girin. Tevî ku dewleta tirkî qaşo xwe dewleteke qanûnî pênase dike, kiryarên wê rastiya wê derdixin holê. Mijara avê û binpêkirina peymanên navneteweyî û peymanên bi Sûriyê re ji aliyê dewleta tirkî ve, kiryarên wê û rastiya armancên wê li herêmê eşkere dikin.

**BINPÊKIRINA PEYMANÊN TÊKILDARÎ ÇAVKANIYÊN AVÊ**

Sala 1987`an, di dema tijîkirina Bendava Atatûrk de dewleta tirkî û hikumeta Sûriyê ji bo sûdgirtina ji ava çemê Firatê peymaneke demkî heta 5 salan imze kirin. Peyman 17`ê Tîrmeha 1987`an pêk hat û tê de dewleta tirkî soz da ku bi awayekî demkî salane zêdetirî 500 metrekabik avê di saniyê de berde, heta ku bi temamî li ser sûdgirtina ji ava Firatê li hev bikin. Sûriye 17`ê Nîsana 1989`an bi Iraqê re peymanek mohr kir û tê de hat diyarkirin ku para Iraqê ji ava Firatê ji sedî 58, para Sûriyê jî ji sedî 42 be. Bi vî awayî salane wê para Sûriyê ji ava Firatê bibe 6,627 milyar metrekabik, para Iraqê 9,106 milyar metrekabik û para dewleta tirkî 15,700 milyar metrekabik be.

Sala 1994`an Sûriye peymana bi dewleta tirkî re mohr kirî, li NY tomar kir da mafê wê û Iraqê misoger bike.



Her çiqasî ev peyman hebe jî, dewleta tirkî salên borî nexasim piştî ku herêmên li ser perava çemê Firatê ji çeteyên DAIŞ`ê hatin rizgarkirin, li aliyê Sûriyê rêjeya ava Firatê kêm kir û bi vê hewl dide ku zorê li gelê bakur û rojhilatê Sûriyê bike û gel neçar bike ku dagîrkirina xaka herêmê qebûl bike. Herwiha avê li ser kantona Hesekê qut dike ku nêzî milyonekî mirov lê dijîn û ji wan 300 hezar koçberên ji Serê Kaniyê û Girê Spî ne.

*ANHA*

# Ji Desteya Aboriyê plana çareserkirina aloziya nan



Desteya Aborî û Çandiniyê ya Herêma Cizîrê, ji bo çareserkirina aloziya nan li herêmê planek danî û sedemên derketina aloziyê ya di demên dawî de, eşkere kir.

Di demên dawî de li bajarên herêma Cizîrê aloziya nan derket. Hin firûnên taybet jî xebata xwe sekinandin û ji Rêveberiya Xweser xwestin ku kîsê "nanê siyahî" ji 500 lîreyên Sûrî bikin 800. Vê jî yekser bandor li jiyana şêniyan kir.

Li gorî Desteya Aborî û Çandiniyê desteyê bi du aşên li taxa Tey ya bajarê Qamişlo ku di binê serweriya hêzên hikumeta Şamê de ye, li hev kir. Lê piştî ku ji aliyê hêzên hikumeta Şamê ve 2`yê Çile alozî hat derxistin, desteyê lihevkirin bi dawî kir û bi hin aşên din yên li bajarê Hesekê re li hev kir.

Sedema duyemîn; hin firûnên herêma Cizîrê xerab bûn. Herwiha daketina nirxê lîreyê Sûriyê beramberî dolar jî bandor kir.

Herwiha dorpêça li herêmê astengiyan li pêşiya Desteya Aborî û Çandiniyê çêdike ku piraniya parçeyên firûn û aşan ji derve bi dolar dikirin.

Hevseroka Desteya Aborî û Çandiniyê ya Herêma Cizîrê Hediya Elî diyar kir ku desteyê dest bi sererastkirina firûnên li herêmê kiriye. Herwiha aşan jî sererast dike û destekê dide wan.

**'5 FIRÛN Û AŞEK WÊ WERIN AVAKIRIN'**

Hediya Elî axaftina xwe wiha domand: "Niha li herêma Cizîrê 5 firûn têne hene. Amadekariya avakirina aşekî ku bikare rojane nêzî 150 heta 200 tonî ard derxe, tê kirin û wê kargeheke taybet ji bo hevîrtirşik were avakirin."

Hediya Elî da zanîn ku desteyê xeta 4`an di firûna Qamişlo de çêkir. Rojane 37 tonî nan çêdike, her wiha belavkirina nan bi kolebeyan çêdibe da ku nan li herêmê tevê were belavkirin û zora li ser firûnên giştî kêm bike.

Hediya Elî diyar kir ku li ser mekanîzmaya xebata firûnên siyahî (firûnên taybet) ji aliyê rêxistinî ve planekê danîne û wiha got: "Deste kîsê ard bi 30 hezar lîreyên Sûriyê dide firûnên siyahî. Armanc ku nirxê kîsê nan bi 500 lîreyî bimîne."

Di dawiyê de hevseroka Desteya Aborî û Çandiniyê ya Herêma Cizîrê Hediya Elî got wê firûnên nû, aş û kargeha havên di nava çend mehan de bikevin xizmetê.

# Fikrê azad nayê girtin

**Hediya HISÊN/Qamişlo**

22 sal di ser kompolya navneteweyî ya li dijî rêber Abdullah Ocalan re derbas dibin. Ocalan bi fikir û felsefeya xwe ya azad piştgiriya gelên bindest kir û şoreşeke demokratîk da destpêkirin. Lê hêzên komploger xwestin pêşiya vê projeya wî bigirin.



Derbarê mijarê de welatiyê bi navê Ferhan Qirtimênî wiha axivî: "22 sal in kompolya li dijî rêber Apo dewam dike. Lê rêberê ku fikir û felsefeya xwe di dilê 40 milyon Kurdî de çandî nayê jibîrkirin. Erê rêber Apo bi bedenî ne li gel me ye, lê bi fikir û felsefeya xwe li gel me ye. Em gelekî aştîxwaz in. Heta rêberê me di zindana Îmralî de be wê çalakiyên me nesekinin"



Endamê saziya Meclisa Malbatên Şehîdan Îsa Qirtimênî jî wiha axivî: "15ê Sibatê ji bo gelê Kurd rojeke reş e. Komploya li dijî rêber Apo çêbûyî li dijî mirovayiyê ye. Armanca dewleta tirkî ya faşîst ji vê komployê şkandina Kurdan bû. Lê bi saya Ocalan Kurdên cîhanê xwedîhêz in. Serkeftina Garê jî bersivek bû ku ti kes nikare Kurdan bişkîne. Ev komplo têk çû, çimkî gelê Kurd li her çar perçên Kurdistanê li ser piyan e. Rêber Apo felsefe ye, dîrok e û 40 milyon Kurd e. Gelê Kurd aşiqê azadiyê ye. Emê li ser piyan bin heta rêberê me azad bibe."


# 15ê Sibatê roja hêrs û xemgîniyê ye

**Darîn Silê/Qamişlo**

15ê Sibata 1999an dewleta tirkî û hêzên navneteweyî li dijî Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocelan komployeke qirêj kirin. 22 sal in ev komplo dewam dike. Dewleta tirkî û komplogeran bi vê komployê xwestin îradeya gelê Kurd bişkîne. Li hemberî vê komployê gel li ber xwe dide û têkoşîna xwe didomîne.


**"KİLÎTA ÇARESERİYA ALOZIYA LI ROJHİLATA NAVÎ SEROKATÎ YE"**

Hevserokê Nivîsgeha Kar û Barê Olan yê Herêma Cizîrê Cibêr Şêx Silêman, li ser komployê wiha axivî: "Her kes dizane ku sala 1999an dewleta tirkî ya dagîrker û hêzên navneteweyî Rêber Apo bi komployekê revandin. Li hemberî vê komployê gelê me li ber xwe dide û ji bo azadiya rêberê xwe têdikoşe. Sûcên li hemberî Rêber Apo di heman demê de li hemberî mirovayiyê ne. Ji ber wê heta dawiyê emê şopdarên mafê Rêberê xwe bin. Tirkiye dixwaze fikir û ramanên rêbertiyê ji gel qut bike û bi wî awayî îradeya gelê Kurd bişkîne. Lê em her dem dibêjin, kilîta çareseriya aloziya Rojhilata Navî serokatî ye. Emê her roj dengê xwe bigihînin sazî û rêxistinên navneteweyî da ku Rêberê xwe ji zindanê azad bikin."





Endamê meclisa PYDê Ednan Kalo jî wiha axivî: "Ji bo gelên aştîxwaz bi taybetî gelê Kurd, meha Sibatê meheke biêş e. Armanca komployê tinekirina gelê kurd bû. Lê ti kes nikare me tine bike.



## Kî li dijî îrada gelê Kurd e?

**Ahmet AKTAŞ**

PDK, bi zanebûn, di vê dema dawî de, dibêje,"PKK, îradeya me ya Başûr qebûl nake"!

Bi vêna jî ranaweste, dibêje "sedemên destdirêjî û dagirkeriya Rojava û Başûr ên dewleta tirka, PKK ye" û hwd.van gotinên ne rast, bi bêbextî û bi bê ûjdanî, di raya giştî de belav dike.

Her wiha li pey wan, hinek kurtêlxwirên Bakur û Rojava jî heman propagandayan belav dikin. Hema yekser divê mirov bêje, yên vê fermanê, vî aqilî dide wan û bi kurtayî vê proje û plana malxerab li ser wan ferz dike dewlêta mêtinger a AKP-MHP'ê ye.

Ji kuderê mirov zane ku ev siyaseta dewleta tirka ye? Yek; heta nuha ti rêveber an berdevkên PKK'ê negotine ku "em îradeya Gelê Başûr qebûl nakin", berovajî, her gotine "em ne bi tenê qebulkirin, em dixwazin bi serokatiya Mesûd Berzanî (ku ev daxwaz ya Rêber APO bû û li pey wî Mam Celal jî heman daxwaz kiribû), KONGREYA NETEWIYA KURDISTAN ava bikin". Weke tê zanîn, li ser vêna hinek gavên hêja jî hatin avêtin. Lê mixabin ji aliyê dewleta tirka ve hete rawestandin!

Dudu; heman zimanî, dewleta tirka jî bikartîne: "Em li dijî PKK'ê ne, ne li dijî Kurda ne. Em ji bo PKK êrîşî Başûr û Rojava dikin" û hwd. Pir aşkere û zelal xwuya dibe ku yên "îradeya gelê kurd nasnake, qebûl nake" ne PKK ye, belê di serî de dewleta dagirker û qirker a R.Erdogan e. Ma çima ewqas zû tê jibirkirin an didin jibîrkirin? Ma yê bi deh caran digot "me şaşiya li Başûr kir (ku me ew Rêveberiya naskir), em nema li Rojava an li cihekî din dikin", ne heman R.Erdagan bû? Ma yê berî herkesî li dijî Referanduma 2017'an a Başûr derket ne ew bû? Yê ku li dijî "yekrêziya PYNK û ENKS'ê" derket dîsa ne ew bûn?

Yê duda jî, ji ber ku heman siyaset û fermana R.T.Erdogan dide meşandin, yekser PDK ye! Ewqas baregehên leşkerî û îstîxbaratî li Başûr ava kirine, ewqas bombaran û topbaran li ser gel dike, dikuje û wêran dike, ma yek gotinek dijberî wan goti ye? Ka em bala xwe bidin Rojava; heman xerabkarî, heta hîn zêdetir; êdî dagirkerî pêkaniye, ma li dijî van kiryarên dewleta faşist a R.Erdogan tiştekî dibêje? Erê, dibêje "gunehkarê wira jî PKK'ye"!

Li gel van hemû nerastiyan û bêbextiyan, careke din û bi dengê bilind, Hevserekê KCK'ê C.Bayik, ev bêexlaqî û bêûjdanî raxistin ber çavan û got "na xêr, ne rast e ku em îradeya Başûr qebûl nakin, em qebûl dikin" û hwd. Belê ji PDK'ê xwest ku ew jî xwe ji bin hevkarî û koletiya dewleta tirka rizgar bike û ji bo Yekîtiya Netewî bi hev ra em kar bikin û hwd.

Ma gelo qebûlkirina hebûna dewleta dagirker li welatê xwe rewa ye, ya jî hebûna hêzêk Kurdistanî li welat rewa ye?

Hêvîdar im ku rastî hatibe zanîn!



# Garê ji dagîkeran re bû goristan

Hin xewn û xeyal dibin bela serê mirovan. Dewleta tirkî ya dagîrker ji bo dagîkirina Garê, Şingalê û dorpêçkirina bakur û rojhilatê Sûrî bi hêviyake mezin berê xwe da herêmê. Lê gerîlayên Kurdisatanê Garê li wan kirin dojeh.

**Jiyan BOZO/Ronahî-Qamişlo**



**"EM JI DIL Û CAN WAN LEHENGAN SILAV DIKIN"**

Siyasetvan Mûna Farûq derbarê mijarê de wiha axivî: "Xewn û xeyalên dewleta tirkî ya dagîrker jinûveavakirina imperetoriya Osmanî ye. Lê em ne Kurdên berê ne, ku em ji wan re serî daynin. Çi dikin bila bikin, emê her tim berxwedana xwe xurttir bikin. Piştî Heftenînê berê xwe dan Garê da gerîlayên me tine bikin. Lê ew pêk nehat û pêk nayê jî. Çimkî berxwedana li Garê çêbûyê berdewama berxwedan Îmralî ye. Dewleta ku bi hêza xwe tevê êrişî Garê kir, têk çû û ji wir baz da. Li hemberî faşîzmê şagirt û şervanên Rêber Apo bi ser ketin. Em ji dil û can wan lehengan silav dikin. Ez di wê baweriyê de me ku emê bi saya van qehremana û bi fikir û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Kurdistaneke azad û serbixwe ava bikin."

**"SIWAR HATIN Û PEYA ÇÛN"**

Hevseroka Yekîtiya Parêzerên Herêma Cizîrê Xedîce Îbrahîm jî wiha diyar kir: "Berî her tiştî berxwedana Garê silav dikim. Ev 22 sal in komployeke navneteweyî li ser gelê Kurd tê meşandin. Bi vê komployê Rêber Apo girtin, lê nikarîn fikir û felsefya wî bigirin. Berî salekê êrişî Heftenînê kir û xwest vîna gelê Kurd li wir bişkîne. Lê gerîlayên me ew têk birin. Ji ber wê berê xwe dan Garê. Weke tê zanîn Garê ciyekî stratêjîk e. Bakur, Başûr û Rojava bi hev ve girê dide. Ji 10ê Sibatê ve bi hovîtiyeke mezin êrişî herêmê dike. Lê gerîlayên azadiyê ji van êrişan re amade bûn. Xeyalên wan ku Garê dagîr bikin û pişt re berê xwe bidin Şingalê û bakur û rojhilatê Sûriyê bixin nava çemberê tev helweşiyan. Mîna ku li Zapê siwar hatin û peya çûn li Garê jî heman tişt hat serê wan. Bi ruhê berxwedana Rêberê me, emê her tim bi ser bikevin. Çimkî slogan me an serkeftin an serkeftin e. Em ti carî serî danayînin."



Xedîca Îbrahîm bi van gotinan axaftina xwe qedand: "Ev têkçûn wê ji hêzên dagîrker re bibe ders. Emê heta dawiyê li ber xwe bidin û bi ser bikevin. Ji bo wê banga min ji her kesî re heye; li derdora şervanên xwe kom bibin û yekîtiya xwe ava bikin. Da em Rêberê xwe azad bikin û Kurdistanê rizgar bikin."

# Ji bo şkandina tecrîdê pêdivî bi xurtkirina têkoşînê heye



Bi hezaran şêniyên Minbicê li dijî Komploya Navneteweyî ya li dijî rêber Abdullah Ocalan bi durişma "Ji dergûşa çandan Minbicê em komployan têk dibin" meşiyan.

Meclisa Jinan bi koordîneya Tevgera Ciwanên Şoreşger ya Sûriyê meşek li dar xist. Di meşê de endamên saziyan, komîteyên Rêveberiya Sîvîl ya Demokratîk, nûnerên partiyên siyasî û bi hezaran welatî amade bûn.

Meş ji ber stasyona El-Hemdûnî ya li ser riya Cizîrê dest pê kir û li ber çerxeriya Cizîrê li rojhilatê bajêr bi dawî bû.

Di mitînga piştî meşê de endama rêveber ya Meclisa Jinan Fadiya Resûl axivî. Fadiya diyar kir ku rêber Abdullah Ocalan ji bo parastina mafên jinan têkoşîn kir û wiha domand: "Ew rêberekî neteweyî ye û jinan hêza xwe ji fikrên wê girt û ji her demê bihêztir bûne.

Cîgira Hevserokatiya Meclisa Rêveber Nûra El-Hamid jî ev nirxandin kir: "Berî 22 salan, piraniya dewletên cîhanê tevlî Komploya Navneteweyî ya li dijî rêber Abdullah Ocalan bûn. Lewre felsefeya kilîta çareserkirina aloziyên Rojhilata Navî ye."

Nûra herwiha pêwîstiya xurtkirina têkoşîn û berxwedanê destnîşan kir ku û diyar kir ku şoreşa li ser fikir û felsefeya rêber Abdullah Ocalan ava bûyî, dikare gelên bindest û azadîxwaz rizgar bike.

Di mîtîngê de hevserokê Tevgera Ciwanên Şoreşger şaxê Minbicê Ehmed El-Cemîlî jî axivî û got, em kompolya li dijî rêberê mirovayiyê Abdullah Ocalan şermezar dikin. Wî bi fikir û felsefeya xwe ya neteweya demokratîk rê li pêşiya me ronî kir da em bigihîjin azadiyê û ji fikrên modernîteya kapîtalîst xilas bibin."

Di dawiya mitîngê de beşdaran bi slognan, berxwedana rêber Abdullah Ocalan silav kir û banga bidawîkirina tecrîdê kirin.

# Kongreya Star sûcê destdirêjiya bi komî ya li Serê Kaniyê şermezar kir

Kongreya Star şaxê kampa Serê Kaniyê destdirêjiya bi komî ya çeteyên dewleta tirkî ya dagîrker li dijî jinekê li girtîgeha Serê Kaniyê, şermezar kir û bang li civaka navneteweyî kir ku erki xwe bi cih bînin û sûcên dagîrekran bi dawî bikin.

Kongreya Star ya kampa Serê Kaniyê ya li taxa Telayai ya bajarê Hesekê, bi daxuyaniyekê destdirêjiya bi komî ya çeteyên dewleta tirkî li Serê Kaniyê li dijî jinekê kirîn, şermezar kir.

Çalakkeran li ser malperên tevna civakî diyar kirin ku çeteyên "Artêşa Niştimanî ya Sûrî" yên girêdayî dewleta tirkî ya dagîrker li bajarê Serê Kaniyê dest avêtine jineke Ereb. Li gorî çalakkeran, jin ji aliyê istixbarata leşkerî ya Tirkiyê ve hatiye girtin û çeteyên bi navê Sedûn Qeytûn û Ebdulrezaq El-Mewlûd destdirêjî lê kirine.

Bi dehan jinên li Kampa Serê Kaniyê, bi beşdariya endama Koordînasyona Kongreya Star şaxê kantona Hesekê Evîn Paşo kom bûn û daxuyanî dan.



Daxuyanî bi zimanê erebî ji aliyê endama rêveber ya Kongreya Star ya kampê Gulîstan Mihemed ve hat xwendin.

Daxuyaniyê bal kişand ser sûcên dagîrkeriya tirkî yên li herêmên dagîrkirî yên bakur û rojhilatê Sûriyê, bi taybetî sûcên li dijî jinan.

Hat gotin, 12'ê vê mehê çeteyên girêdayî dewleta tirkî li herêma Serê Kaniyê dest avêtine jineke girtî ya bi navê (R. E) û bang li raya giştî hat kirin ku ji bêdengiya xwe derkeve, bilez destwerdanê bike, sûcên dagîrkeriya tirkî û çeteyên wê yên li herêmên dagîrkerî dikin, bi dawî bike.

# Sînemxan: Kurdistaneke azad bi yekîtiya Kurdan pêkan e

Keça Mîr Celadet Bedirxan Sînemxan, banga bi dawî anîna aloziyên di navbera hêzên Kurd de kir û got, "Kurdistanek azad xewna mine, ev jî bi yekîtiya Kurd dibe. Divê Kurd bihevre li ser wê bifikirin ku ka wê çawa xwe ji destê Erdogan rizgar bikin."

Şandeyek ji Nûnertiya HDP'ê ya Herêma Kurdistanê serdana keça Mîr Celadet Bedirxan Sînem Bedirxan a li Hewlêrê jiyan dike, kir. Şandeyê diyar kir, Sînem Bedirxan bi serdana wan gelekî kêfxweş bûye, peyam û daxwaza wê ya herî zêde yekîtiya Kurd û têkoşîna ji bo avakirina Kurdistaneke yekgirtî û azad bûye.

Sînem Bedirxan kêfxweşiya xwe ya ji serdana şandeya Nûnertiya HDP'ê wiha tîne ziman; "Bi dîtina we gelek kêfxweşbûm. Ez gihîştim vê temenê, hêviya min ewe ku ez Kurdistaneke azad bibînim. Ne bêjin Başûr, Rojava, Rojhilat û Bakur, bêjin Kurdistan. Dixwazim pasaporteke min hebe, li ser wê Kurdistan nivîsîbe. Hêvîdarim ku beriya ez xatirê xwe ji we bixwazim, vêya bibînim. Ev xeyaleke, dixwazim ev xeyala min bibe rastî."

Sînem Bedirxan, li ser aloziyên di navbera Kurdan de jî van hişyariyan kir, " Êdî bes bêjin filan hizb û bêhvan hizb. Dayîka min Rehşanxan digot, 'Yekîtiya Kurdan bide min, ezê Kurdistaneke azad bidim te.' Hêvî dikim emê vê Kurdistanê bibînin. Em hemû Kurdin û divê em ferq nexin navbera ti aliyekî de."

Sînem Berdixan di beşeke din a axaftina xwede jî îşaret bi zilma Erdogan a li gelê Bakurê Kurdistanê dike jî kir û got; " Divê em tev bihevre li dijî zilma ku li ser Bakurê Kurdistanê tê kirin, rabin. Pêwîste em rûnin, ne bi şer û pevçûn, bi şêwazeke medenî û diyalogê bikin, rewşê gotûbêj bikin. Divê êdî em hev kuştinê ji bîr bikin. Pêwîste em li ser wê bifikirin ka emê weke Kurd xwe çawa ji destê Erdogan rizgar bikin."

*(rojnwes)*



# Navenda PENa Kurdî bi navê “Li Îranê Qirkirina Kurdan” raporek weşand

Navenda PENa Kurdî têkildarî sûcên hikumeta Îranê yên li dijî gelê Kurd û hemelyên girtinê li rojhilatê Kurdistanê raporek belav kir.

Komîteya Rêveberiya Giştî ya Navenda PENa Kurdî li ser zordariya hikumeta Îranê ya li dijî gelê Kurd yê rojhilatê Kurdistanê û hemleyên girtinê ku di meha derbasbûyî de zêdetirî 100 nivîskar, aktîvîst, endamên rêxistinên sîvîl û şagirt hatin girtin, raporek weşand.

Rapora Navenda PENa Kurdî wiha ye:

“Zêdeyî du mehan e dewleta Îranê li dijî Kurdan operasyoneke nû daye destpêkirin û jimara girtiyên meha derbasbûyî tenê ji sedan derbas bûye. Di nava wan de nivîskar, aktivîst, endamên rêxistinên sîvîl û şagirt hene û bê ku ti sebep bên diyarkirin hatine girtin. Yek ji wan nivîskar, serokê Enstîtûya Çand û Perwerdeyê ya li Bokan Mûstafa Ilkhanîzadeh e ku li Zindana Bokan girtî ye. Nivîskar Seyid Erdeşêr Mûsevî, nivîskar Mustefa Bagirî Aşna û çalakvan Xelîl Esedî Bojanîlî ku berê hatibûn girtin, 30.01.2021’ê ceza xwarin û derbasî zindana Kirmaşanê kirin. Lê gelek malbatên girtiyan nizanin ka zarokên wan li kû ne û pir bifikar in, lewre hin girtî bi işkenceyê hatine kuştin. Dewleta Îranê gefan li malbatê girtiyan dixwe ku agahiyan nedin çapemeniyê, televizyonan, yan jî rêxistinên mafê mirovan. Ji ber wê bêguman, jimara girtî û bûyeran ji yên tên zanîn pirtir e.

## KCK: Em Rêber Apo bikin rêberê mirovayiyê

Konseya Serokatiya Giştî ya KCK’ê diyar ku armanca komployê ew bû ku Kurdan bê Rêbertî, nasname û statû bihêlin û got, em bang dikin ku emê Rêber Apo pirtir bikin yê mirovayiyê.

Konseya Serokatiya Giştî ya KCK’ê bi pêmana salvegera kompolya 15’ê Sibatê daxuyaniyeke nivîskî da.

Di daxuyaniyê de wiha hat gotin:

“Em hêzên komploger û komploya navnetewî ya 15’ê Sibata 1999’an ku di şexsê Rêber Apo de li hemberî gelê Kurd hat kirin, careke din bi kîn û hêrseke mezin şermezar dikin.

Di şexsê Halît Oral, Selamet Menteş, Aynûr Artan, Viyan Caf, Zulkuf Gezer û hevala Zehra de, ku bi armanca protestokirina komployê û avakirina xeleka ewlekariyê ya saxlem li dora Rêber Apo bi ruhekî fedayî bedena xwe dan agir, Şehîdên “Ti Kes Nikare Roja Me Tarî Bike” bi rêz û minetdarî bîr tînîn û bejna xwe li hemberî bîranîna wan ditewînîn.

Em Rêber Apo ku di nava şertên esareta Îmralî de li hemberî işkence, tecrîd û îzolasyona mutleq ku heta roja îro li berxwe dide, silav dikin.

Di serî de hevalên li girtîgehan ku nêzî sê mehan e di çarçoveya pêngava “Bes e ji tecrîd û faşîzmê re, dem dema azadiyê ye” de dest bi greva birçîbûnê kirine, berxwedan û çalakiyên demokratîk yên gelê me û dostên wî li her çar parçeyên Kurdistanê û li derveyî welat dijîn pêşxistî bi kelecanê silav dikîn.



### ARMANCA BINGEHÎ YA KOMPLOYÊ BÊRÊBERTÎ, BÊNASNAME Û BÊSTATÛHIŞTIN E

Armanca sereke ya kompoya navnetewî ya 15’ê Sibatê tam weke sedsalan 20’an bû ku dixwestin Kurdan di sedsala 21’ê de jî bê Rêbertî, bê nasme û bê statû bihêlin. Dixwestin sedsaleke din bi gelê Kurd ku neteweyeke bêdewlet bû bidin windakirin. Lê hişmendiya nû û bêhempa ya berxwedanê ya Rêber Apo nîşan dayî, bi afirandêriya ramanî û hilberandêriya xwe û bi asta bilind ya xwedîderketinê ya gelê me, armancên gemar yên komployê hatine pûçkirin. Lê ev armancên komployê yên ku hatine pûçkirin, ji hêla hêzên komploger ve bi rengên nûjenkirî bi rê û rêbazên nû hewl tê dayîn were domandin.

### RÊBER APO RÊBERÊ RIZGARIYA MIROVAYIYÊ Û DEMOKRATÎK E

Rêber Apo şertên girtîbûnê yên bi işkence yên li Îmralî bi hêza ramanê têk biriye, paradîgmaya demokratîk, ekolojîk ya li ser azadiya jinê ava kiriye, di serî de gelê Kurd, diyarî gelên çewisandî yên Rojhilata Navî û cîhanê kiriye. Ev geşedana diyaletkîk ku Rêber Apo dijî, berzbûna bêhempa ya maneyê ye. Her ku ev asta ramana bêhempa ya li nav şertên işkenceya tecrîd ya mutleq derketî holê were wergerandin û bihihije ber destê gelan û mirovayiyê, rê li ber xwedîderketineke mezin vedike. Her ku Moderniteya Demokratîk, civaka demokratîk, fikra jina azad nas dikin, li bara Rêbertiya me sempatiyeke mezin a gelan çêdibe. Ji ber vê di serî de jin, hemû civakên çewisandî yên demokratîk Rêber Apo ne tenê weke rêberê civakeke li ber qirkirinê lê weke rêberê mirovahiyê dibînin û weke rêberê rizgariya demokratîk dibînin û wiha lê xwedî derdikevin.

### ROJÊN SERFIRAZIYÊ NÊZÎK IN Û EM HEMÛ BI HEV RE BI TEQEZÎ EMÊ BI SER BIKEVIN

Pêngava, ‘’Dema Wê hatiye! Niha dema azadiyê ye!’ dengê hemû derdorên ku li Rêber Apo xwedî derdikevin, azweriyên jiyana azad tîne cem hev, di çemê demokrasî û azadiyê de digihîne hev. Ev pêngav ne tenê ya Kurdan e. Bûye pêngava azadî û demokrasiyê ya hemû mirovayiyê. Em li ser navê Rêber Apo malavayiyê li wan hemû kesan, dostan dikin ku bi asta cîhanî tevlî pêngavê bûne û desteke xwe radigihînin, em wan bi heskirin, hurmet slav dikin, têkoşîna wan slav dikin.

## Malbatên şehîdan banga qedandina êrişên dewleta tirkî kirin

Meclisa Malbatên Şehîdan ya herêma Firatê, bang li raya giştî ya cîhanê kir ku li hemberî êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên li dijî Kurdistanê bêdeng nemîne. Nerazîbûna gel li hemberî êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên li dijî bajarên Kurdan li tevayiya Kurdistanê, zêde dibe. Dewleta tirkî piştî binkeftina xwe li Heftanînê niha jî êrişî Garê dike.

Derbarê mijarê de Meclisa Malbatên Şehîdan ya herêma Firatê daxuyaniyek da. Endamên meclisê Eyşe Efendî û Ronahî Heco daxuyanî xwendin.

Meclisê diyar kir ku dewleta tirkî ya dagîrker bi hevkariya çekdarên malbata Barzanî û bi balafirên şer bi armanca tinekirina HPGê û dagîrkirina herêmê, êrişî herêma Garê ya başûrê Kurdistanê kir.

Meclisê got, êdî gelê Kurd xwe bi fikir û felsefeya rêber Abdullah Ocalan biçek kiriye, vîna azad û vîna şoreşa rast wê li hemberî xiyanetê bi ser bikeve.

Meclisê di dewama daxuyaniya xwe de bang li gelên azadîxwaz û gelê başûrê Kurdistanê kir ku li hemberî xiyanetê û dijminên Kurdistanê serî hildin û piştgiriya berxwedana şervanên li çiyayên Garê bikin.





## 3 Şer û 3 Kompoyên Navneteweyî

Farûk SAKIK

Di pêvajoya şerê cîhanê yê yekem de rojên zor û zahmet li pêş Komara Tirkiyê bûn. Li navendên Ewrûpa axa wan dihat dabeşkirin, lê ew vedigeriyan êrişî gelên Anatolyayê dikirin. Ketibûn nav hewldanan ku li gorî nasnameya ‘Tirk û Sunnî’ li ser bingeha netew-dewletê komarek ava bikin. Wisa kirin. Li ser vî esasî Ermen, Rûm, Asûr û Siryan tune kirin. Gelê Xirîstiyan jî ji Anatolyayê derxistin. Çerkez, Ereb û Laz ên Misilman jî di nav nasnameya Tirkbûnê de helandin. Anîn wê astê ku ev gel nikarin ji bo xwe tiştekî bixwazin.

Lê ji bo Kurdan li benda dawiya şer sekinîn. Şer bi dawî bû, vegeriyan êrişî Kurdan kirin. Dixwestin Kurdan jî tune bikin û bigihîjin armanca xwe ya nîjadperest.

Serhiladanên Kurdan hebûn, lê bi komkujiyên mezin û hovane bersiv dan van serhildanan. Bi Şêx Saîd re kompoya li dijî Kurdan destpêkir û bi vî awayî jî pêvajoya şerê yekem bi encam bû.

Heta dema şerê cîhanê yê duyem li Kurdistanê bêdengî hebû. Dewleta Tirk a dagirker li gorî xwe siyasetek şer di meşand. Di pêvajoya şer de, li Rojhelat “Komara Kurdistan” hatibû avakirin. Kompoya navnetewî ket dewrê û bi tenê destûra 11 mehan dan vê komarê. Piştî şer, berjewendiyên dewletan bi peymanan dihatin mîsogerkirin û parastin. Lê Kurdistan jî dikirin qûrbana van peymanan.

Dema ku şerê cîhanê yê sêyem destpêkir wan dewletên dagirker dîtin ku wê wisa bi hêsan nebe. Dîtin bi navê PKK’ê tevgerek û bi navê Abdullah Ocalan rêberek wan heye. Li benda dawiya şer nesekinîn û di destpêka şer de, wan jî komplo dan destpêkirin. Heta 9’ê Cotmeha 1998’an ku Ocalan ji Rojhilata Navîn derkeve, gelek hewldanên wan û amadekariyên wan hebûn. Piştî ku rêber Apo dîl hatin girtin û radestî dewleta Tirk kirin, digotin êdî li cîhê me şer dayî seknandin em dikarin careke din bidin destpêkirin.

Di 2003’yan de hatin Iraqê-Rojhilata Navîn, PKK jî li rojhilata navîn bû. Bi derengî ketibûn. Dema ku careke din şer destpêkir, fikir û ramanên Ocalan li ser wê axê êdî belav bûbû.

Her çiqas, Ocalan dîl hatibû girtin jî, di şertên tecrîdê de, bi nexşeriyên xwe di vî şerî de eniyên berxwedanê vedikir. Xwestin, rê li pêşiya vê yekê bigirin û li Osla, Bruksel û Cenewrê, ketin du leyîstikên nû. Dîsa jî bi serneketin.

Dema 2011’an şerê cîhanê yê sêyem destpêkir, bi navê “Bihara Gelan” derbasî merhaleyek nû bûn, li aliyek jî amadekariya şerê Sûrî dikirin. Dixwestin di vî şerê Sûrî de Kurdan tune bikin. Kurdan bi şoreşa Rojava bersiv dan. Bi navê DAÎŞ rêxistinek avakirin û veguhastin Kurdistan. Şervanên ku li ser singê wan rozetên Ocalan hebûn, ew çeteyên hov ji ser wê xakê paqijkirin. Dewletên Komploger û dewleta Tirk bi hêrs bûn. Di 2015’an de li Bakûrê Kurdistan şer dane destpêkirin û li Rojava jî bi destûr û hevkariya dewletên komploger, dest bi êrîşan kirin. Efrîn, Grê-Spî û Serêkaniyê hatin dagirkirin.

Di Sibata 2021’an de dewleta Tirk ji dewletên komploger dixwest, li Başûrê Kurdistan, li Garê jî, wek Efrînê û Serêkaniyê êrişên dagirkeriyê pêk bîne. Destûr danê. Lê li vê derê gerîllayên ku soz dane Rêber Apo li hemberî wan bûn mertal. Şer gihîşt merhaleyeke ku ji bo reva xwe wext nedîtin. Ev destûrên ku dan dewleta Tirk hemû efektên dewamkirina komployê bûn.

Lê dîsa jî bi derengî ketibûn. Ev car jî fikir û ramanên Ocalan, ji sînorê Rojhilata Navîn derbas kir û li cîhanê belav bûbû. Îroj li her deverê cîhanê ji bo azadiya Ocalan têkoşînek tê dayîn. Êdî li welatên komplogeran, gel li ber deriyên avahiyên parlementoyê wan, bi yek dengî diqîrin û dibêjin; “Dem dema azadiya Ocalan e!”



# KCK: Dagîrker şevekê ji nişka ve reviyan

KCK’ê têkildarî êriş û berxwedana li Garê daxuyanî da û got, hêzên dagîrker yên digotin emê şevekê ji nişka ve werin û propagandaya tasfiyekirina gerîla dikirin, digel her cure teknîk û bombebaranê, li benda serkeftinê bûn lê di binê wê bombebaranê de şevekê ji nişka ve reviyan.

Hevserokatiya Konseya Rêveber ya KCK’ê daxuyaniyeke nivîskî weşand û got, ew derba giran ya li Garê li artêşa tirkî ya dagîrker hatî xistin, serkeftina Kurdan tevan e. Dixwest bi 15’ê Sibatê re qaşo cejinê bikin. Ev berxwedan serkeftina Kurdan tevan e. Divê Kurdên li her çar parçeyên Kurdistsanê û yên li derveyî welat vê berxwedanê weke cejnekê pîroz bikin. Ev derba giran divê bibe riya têkbirina kompoya meha Sibatê û azadiya Rêber Apo û gelê Kurd pêk were.

Di dewama daxuyaniyê de wiha hat gotin: “Weke 10’ê Sibatê 2008’an li Zapê hatî kirin, li Herêmên Parastinê yên Medya jî êrişeke dagîrkeriyê hat destpêkirin. Di 4 rojan de herî kêm 50 balefir û bi dehan helîkopteran qada Garê bombebaran kirin. Bi vê bomberdûmanê re xwestin gelek leşkeran daynin qadê. Lê ev hewldana wan bi giranî hat şkandin.



### ARMANCA WAN EW BÛ KU

Li cihên leşker danîn jî gerîlayên HPG û YJA Starê berxwedaneke dîrokî nîşan dan û derbên giran li artêşa tirkî dan. Em vê serkeftinê pîroz dikin û gerîlayên fedayî yên di berxwedana parastina hebûna gelê Kurd de, bi rêz û hurmet bîr tînin.”

### QIRKIRINA LI SER KURDAN BIBIN SERÎ

Televizyonên dewleta tikî ragihandibûn ku wê di nêz de li Enqere pîrozbayiyê bikin. Di salvegera 22. ya kompoya navneteweyî de wê cejina têkbirina PKK’ê ragihandibûna. Hêzên dagîrker ku digotin emê şevekê ji nişka ve werin û propagandaya tasfiyekirina gerîla dikirin, ligel her cure teknîk û bombebaranê li benda serkeftinê bûn, lê di bin wê bombebaranê de şevekê ji nişka ve reviyane. Weke li Zapê siwar hatin peya çûn. Serkeftina wan reva wan ya weke sala 2008’an e ku serokê artêşa giştî Yaşar Buyukanit gotibû me bi hêsanî leşkerên xwe vekişand.in

Berî êrişê çûn Iraqê û diyar kirine ku wê PKK’ê tasfiye bikin. Piştre çûna Hewlêrê û tevî PDK’ê awayê dawî yê vê planê çêkirin. Piştî qebûlirin û piştgiriya istîxbaratê ya PDK’ê 10’ê Sibatê dest bi êrişê kirine. Bi vê êrişê re qaşo wê weke Sibata 2008’an navenda kontrolê ya fermandariya gerîla bihata tinekirin, pişt re jî wê berê xwe bidana tevayiya qadên gerîla.

### DEMA PÊKANÎNA AZADIYA RÊBER APO Û YA GELÊ KURD E

Divê were zanîn ku ev êriş ji bo tinekirina PKK’ê û temamkirina qirkirina gelê Kurd hatiye plankirin. Piştî tinekirina PKK û gerîla wê statûya başûrê Kurdistanê jî ji holê rakirana. Divê Kurdên li her çar parçeyên Kurdistsanê û yên li derveyî welat vê berxwedanê weke cejnekê pîroz bikin. Divê ev derba giran bibe wesîleya têkbirina kompoya meha Sibatê û azadiya Rêber Apo û gelê Kurd pêk were.

### GERÎLA PARÊZVANÊ STATÛYA BAŞÛRÊ KURDISTANÊ YE

Vê berxwedanê dîsa nîşan daye ku gerîla parêzvanê statûya başûrê Kurdistanê ye. Gerîla li hemberî êrişa DAIŞ’ê di serî de Hewlêr û Kerkûk, başûrê Kurdistanê diparêze û careke din nîşan daye ku başûrê Kurdistanê diparêzin.

## Berxwedana 23 salan komplo têk bir

Jiyan BOZO/Qamişlo

15ê Sibata 1999an bi komployeke navneteweyî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan radestî dewleta tirkî ya dagîrker hat kirin. 22 sal in li hemberî wî kiryarên dijmirovî tên kirin.

Têkîldarê mijarê endamê Akademiya Zanistên Civakî Mûnzûr Şiyar wiha axivî: “Em di serî de vê komployê şermezar dikin. Ev komplo 1999an ket piratîkê. Lê berî wê bi çend salan li dijî rêbertiya me dest pê kiribû. Fikir û felsefeya rêber Apo di dilê hêzên serdest de tirseke mezin çêkiribû. Ji ber wê di kesayeta rêbertiya me de gelê Kurdistanê û Rojhilata Navî tev kirin hedef. Vê ji gotina “Kurdistan mêtîngeh e” dest pê kir. PKKê karîbû gel zana bike û Kurdistanê ji bin destê dagîkeran derxe. Ji bo wê ev xetereke mezin bû li ser berjewendiyên wan. Çimkî fikir û felsefeya serokatiyê li dijî kapîtalîzm û emperyalîzmê ye. Fikirekî li ser bingehê civakeke azad, wekhev û demokratîk e. Ji ber wê 1996an bi teqîneke li Şamê xwestin rêbertiya me tine bikin û 15 Sibata 1999an bi komployeke navnetewî radestî Tirkiyê hat kirin. Bi vê komployê xwestin tevgera me tesfiye bikin. Ev, salên 2003 û 2004 bi awyekî berfireh hat kirin.”

### “DEM DEMA AZADIYA RÊBER APO YE”

Mûnzûr Şiyar axaftina xwe wiha domand: “Tişta ku dihat kirin pir mezin û kûr bû. Bi salan serokatiya me fikrê sosyalîzmê diparast. Lê sosyalîzimê xiyaneteke mezin li wî û îlkeyên xwe kir. Cara yekê di diroka mirovayiyê de, sosyalîzim û kapîtalîzim li ser rêbertiya me bûn yek. Ev moreke reş e, wê tim li eniya wan be. Ya ku niha jî li herêma tên kirin berdewamiya heman komployê ye. Rêbertiya me ev tesbît kir û her tim rexne dike. Giretina Rêber Apo ji bo gelê Kurd û Rojhilata Navî tevê wendayeke pir mezin bû. Çimkî rêbertî bi fikrê xwe karîbû gelên herêmê bike yek. Herwiha cereseriya pirsgirêkên herêmê tevê bi seroktiyê ve girêdayî ye. Ji bo wê serokatî kirin hedef û tecrîdeke giran li ser dan meşandin. Çimkî baş dizanin ku her gotineke rêbertiyê hêzeke mezin dide gel û partiyê. Ji bo ku rêbertiyê ji civakê qut bikin, her tiştî dikin, da gel tine bikin. Lê Rêber Apo bi berxwedana xwe komplo vala derxist. Bi paradîgmaya Neteweya Demokratîk bersiva herî mezin bû ji komplogeran re. Cara yekê ye ku li Rojhilata Navî hevgirtina gelan pêş dikeve. Ji cîhanê tevê re da isbatkirin ku Kurd pêşengên aştî û wekheviyê ne.”



Endamê Ekadimiya Zanistên Civakî Mûnzûr Şiyar wiha qedand: “Rêber Apo li dijî Moderniteya Kapîtalîs Moderniteya Demkratîk pêş xist. Hêzên komplo pêk anîn xistin bin lêpirsînê û got, hûn civak û neteweyên heyî tesfiye dikin. Bi vê modelê moderniteya Kapîtalîs li hemberî fikirê Rêber Apo îflas kir û têk çû. Ji bo ku em azadiya rêberê xwe ya fîzîkî bi dest bixin divê em yekîtiya xwe ava bikin. Xwedîderketina li Rêber Apo erkê me ye divê her kes asta tekoşîna xwe xurttir bike. Çimkî dem dema azadiya Rêber Apo ye û ji tecrîdêre êdî bes e.”

## Kompoya 15ê Sibatê tê kûrkirin

Zekî BEDRAN



Dewleta tirkî tevgera xwe ya tinekirinê li ser gelê Kurd didomîne. 15ê Sibata 1999an rêber Apo bi komployeke navneteweyî dabûn Tirkiyê. Di ser vê komployê re 22 sal borîn. Îmralî ji dinyayê re girtin û ji bo bigihin armanca xwe serî li her hîleyê dan. Di salên dawiyê de jî hewldanên xwe yên tesfiyeyê didomîne. 9ê Cotmehê rêber Apo ji Sûriyê derketibû. Di salvegera komployê de 9ê Cotmeha 2019an êrişî Serê Kaniyê û Girê Spî kirin. Niha jî di salvegera komployê de nîvê Sibatê êrişî Garê kirin.

Dewleta tirkî li bakurê Kurdistanê ji bo şkandina berxwedanê û tevizandina gel tişta nekirî nemaye. Desthilatdariya herî faşîst ya dîroka xwe ava kirin. Li hemberî Rojava û Başûr digel êrişkarî, dagîrkerî û komkujiyan tişta dixwestin bi dest nexistin. Giraniya xwe dan istixbaratê û êrişên hewayî. Rêbazên şerê taybet heta dawiyê bi kar anî. Bi taybetî xwestin pêşengên tevgerê tine bikin. Digel her tiştî berxwedana tevgerê dewam kir û gelê Kurd teslîm nebû.

PKK û gerîla di şkestina DAIŞê de roleke dîrokî lîstin. Lê dewleta tirkî bi DAIŞê re itîfaq kir. Niha jî ev çeteyên biçek, bermayiyên DAIŞê û El Nusra li dora xwe kom kirine û ji bo armanca xwe bi kar tîne. Dema hêzên kurdî yên berxwedanê li Sûriye û Iraqê li hemberî DAIŞê şer dikirin, Emerîka û Ewropa ji rewşê memnûn bûn. Leşkerên xwe rênedikirin qada şer. Piştî şkestina DAIŞê, yên DAIŞ şkandîn bi destê dagîrkerên tirk yên faşîst û çeteyên wan dide kuştin. Li hemberî dagîrkirina Efrîn û Serê Kaniyê bêdeng man, destek dan. Ciyê leşkerên tirk ketînê Kurd ji wan deveran derxistin. Qirkirin û sûcên şer kirin.

Kurd li ber xwe dide û bedelan dide. Di heman demê de xwe bi rêxistin kiriye û zana bûye. Êdî ji polîtîkayê, lîstikên dibin û bazarkirinê agahdar in. Bê piştgiriya Emerîka û NATO Tirkiye nikara van êrişan bike. Dagîrkerên Tirkan êrişî Garê kirine, ti kesî êrişî wan nekiriye. Herwisa hiqûqa dewletan binpê kiriye û ketiye erdê dewleteke din. Ji bo kuştin û tinekirinê ket wir. Dema di şer de leşkerên Tirk dimirin Emerîka diyar dike ku piştgiriya hevalbenda xwe dike û sersaxiyê dixwaze. Ya neheq û êrişkar artêşa tirkî ye. Di van êrişan de windayiyên Kurdan jî çêbûne. Emerîka ji bo Kurdan sersaxiyê naxwaze. Eger Emerîka û NATO li hemberî van êrişan rawestin û ji bo aştyê navcîtiyê bikin wê pêşiya xwînê bê girtin. Eger Emerîka û Ewropa li dijî şer bin Tirkiye nikare êrişa bike. PDK û hêzên kurdî yên din jî dikarin mesafeyê bixin navbera xwe û dagîrkerên Tirkan. Hem wê nakokiyên nava Kurdan zêde nebin, hem pêşiya windayiyan bê girtin.

Dewleta tirkî ji bo perçiqandina Kurdan dixebite ku ciyên wan yên stratejîk parçe parçe dagîrk bike û wan tesfiye bike. Tirkiye sînorê xwe û Iraqû bi kalekolan asê kiriye. Sînorê Rojava dîwar kiriye. Li sînorê Îranê jî heman tiştî dike. Digel van dixwaze herêmên gerîla yên li Başûr jî parçe parçe daqurtîne. Eger desteka Emerîka û tevlîbûna PDKê bi rengekî tinebe Tirkiye nikare wiha tev bigere. Dewleta tirkî û hevalbendên wê dihizirîn ku bi kompoya 15ê Sibatê û girtina rêber Apo li zindanê wê PKK ji hev belav bibe û gelê Kurd jî bêrêber û bêçare bimîne. Lê hêviya wan pêk nehat. Rêbertî tesfiye nebû. Niha bi heman armancê piştî 22 salan di salvegera vê dîlgirtinê de dixebitin Garê dagîr bikin.

Em di pêvajoyeke dîrokî de ne. Kurd, yan wê vê siyaseta qirkirin û êrişên tinekirinê bisekinînin, yan wê bandora faşîzma tirkî li Kurdistanê pirtir bibe. Ciyê dewleta tirkî lê bibandor be mafê jiyanê nade Kurdan. Hebûn, destkeftî û statûyên wan nabin. Di serî de civaka Iraqê divê welatên erebî li hemberî vê hovîtiyê dengê xwe bilind bikin. Kesên dibêjin, em li dijî dagîrkerî, faşîzm û komkujiyan in, dema wê ye ku bilez bikevin nava tevgerê.